

## **Daxuyanîya ”Konferansa Zimanê Kurdî” ya li Berlînê**

”Konferansa Zimanê Kurdî” di roja ”14ê Gulanê, Cejna Zimanê Kurdî” da, du roja, di 14 – 15ê Gulanê da li avahîyê Parlemeta Eyaleta Berlînê li Salona Kulturê pêkhat. Ji hemû parçeyên Kurdistanê û dîasporayê nivîskar, akademîsyen û ronakbîrên Kurd beşdar bûn. Di konferansê da pirs û pirsgirêkên zimanê Kurdî bi giştî û berfireh hatin axivtin, gotûbêj û riberizên berwer li ser hatin kirin. Di encam da hewce hate dîtin ku ev daxuyanîye bête belav kirin.

1. Maka problemên zimanê Kurdî rewş û statuya dagîrî û kolonyal ya li Kurdistanê ye. Dewletên kolonyalîst û dagîrker rengareng asteng, gir û giriftarî derêxistine pêşîya zimanê Kurdî. Bi taybetî Tirkîye û herwisa Iran û Sûrîye jî, bi çu awayî rê nadin ku Kurdî bikeve nav sîstemê perwerdeya fermî ya dewletê. Ji xwe li bakur û Tirkîyeyê di warê axivtin û nivîsînê da, asîmîlasyonê nedîtî di dereceya mirandinê da li ser Kurdî tete domandin. Dîsa xemsaîya navxweyî ya xelkê me jî wekî otoasîmîlasyon encam dide û avê dikêşe ser aşê asîmîlasyonê dewleta Tirk. Lewma konferans ji bo her reng asîmîlasyonê dibêje êdî bes e!
2. Konferans bang li van dewletên navkirî dike ku zimanê Kurdî di nav sîstemê perwerdeya fermî da bi cih bikin û zimanê Kurdî bikine zimanê duyê yê fermî yê dewletê.
3. Konferans bang li bispor û zanayên zimanî yên Kurd dike ku ji bo standrtkirina zimanê Kurdî û zaravayên Kurdî di nav kar û xebateke zanyarî û kolektîv da bin. Ji bo ku kar û xebatên li ser ziman bi aheng û berwer bêne kirin, ji bo ku pirs û pirsgirêkên zimanî bêne çareser kirin, ji bo ku hewcehiyên zimanî bêne dîtin Akademîya Zimanê Kurdî bête avakirin.
4. Konferans ji bo paşeroja zimanê Kurdî û di hev gihiştina xelkê Kurd da, şertekî jîyanî dizane ku alfabe ya Kurdî ya hemû zaravayan bibe yêk.
5. Konferans di wê bawerîyê da ye ku, li her parçeyê Kurdistanê, zaravayê ku bi nifûsa xwe ve piranî, bibe zaravayê giştî û zaravayê kêmanî jî di nav navçeyê xwe da paralelî zaravayê piranî wekhev fermîyen bête bi kar înan û pir zaravayî ya zimanê Kurdî bête parastin.
6. Konferans herweha di wê bawerîyê da ye ku, garantîya paşeroja neteweyê Kurd bi parastina zimanî dibe. Lewma bi taybetî bang li xelkê Kurd yê li Tirkîye û bakura Kurdistanê jî dike ku ji bo bi kar înana zimanê Kurdî bi berpirsiyarî rabin û dijî asîmîlasyonê dewleta Tirk zimanê xwe biparêzin.
7. Konferans bang li Yêkitîya Ewrûpayê [YE] dike ku di prosesa endametiya YE ya Tirkîyeyê da fişarê li ser dewleta Tirk bike ku perwerdeya zimanê Kurdî û perwerdeya bi zimanê Kurdî bike nav sîstemê perwerdeya fermî û di makqanûna xwe da hilgire bin garantîyê.
8. Konferans ji bilî deklerasyonê xwe ya bi pirsê ziman ve girêdayî, dixwaze bangeke giştî ya neteweyî jî bide: Konferans, êrişên dewletên Tirkîye, Îran û Sûrîyeyê yên li ser xelkê Kurd û Kurdistanê şermizar û protesto dike û bang li neteweyê Kurd û berpirsiyaran dike ku tifaqa neteweyî di serê her tiştî bigirin û di têkoşîna parastina Kurd, Kurdî û Kurdistanê da yêk bigirin. Konferans herweha hêvî dike ku ev reng kar û xebatên zanyarî û ronakbîrî bêne domandin û xelkê Kurd û desthilatdarên polîtîk yên Kurdistanê jî hevkar û piştevan bin.

**Konferansa Zimanê Kurdî  
14-15 Gulan 2008, Berlîn**